Bidestveanîna Mafên Netewî Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 150
6'ê Çileya Paşîn a 2010
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

**Peyama pîrozbahiya Sekreterê** Giştî bi boneya cejna kirîsmes û sersala nû a Zayînî ve

Bi boneya roja lidayîkbûna Îsa Mesîh û sersala nû a Zayînî ve, em pîrozbahiyê ji hemû mesîhiyên Îranê û bi taybet mesîhiyên akinciyê Kurdistanê dikin û salek pir ji xweşî û şadiyê bo wan bi hêvî dixwazin

**PDK Îran**
**Sekreterê Giştî - Mistefa Hicrî**
**29.12.2010, (08.10.1389)**

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîn www.kurdistanmedia.com/kurdi



**Mesûd Barzanî wekî kesayetiyê sala** 2010'an hat hilbijartin

Di rapirsînekê de li Iraqê ku ji aliyê Ajansa Al Axbariye ve hat çêkirin, serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî, yekemîn derket. Kesayetiyên ku di rapirsînê de cih girtibûn: Nûrî Malikî, Celal Talabanî, Tariq Hasimî, Eyad Elawî û Usama Nucêfî, Di nava wan kesayetiyan de serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî di rêza yekemîn de cih girt.

**Piştevaniya PDK Îran ê ji berbijarkirina Sidîq**

Kebûdwend bo wergirtina xelata Aştî a Nobelê

Rûpel. 2



# Pêlên Nû Yên Îdamê Îran Hejandin

## Di heyamê 13 rojan de 40 kes hatin îdamkirin

Pêvajoya Îdama çalakên siyasî û sivîl li seranserê Îranê di bin navên curbicur de her roj xurttir dibe. Eva jî li halekê de ye ku du hefteyan berî niha Komara Îslamî jiber pêpeskirina mafê mirov di biryarnameyekê de ji aliyê şêvra mafê mirov a NY ve hat mehkûm û şermezarkirin.

Berdevkê Saziya Mafê Mirov a Îranê, Mihemed Emîrîmuqedem, piştî mehkûmkirina Îdamên roja Duşemî, 3'ê Çileya Paşîn, ji civaka navnetewî daxwaz kir ku dijkiriyarekî tund li hember wan îdaman ji xwe nîşan bide.

Navbirî got ku: Nebûna dijkiriyarek tund ji aliyê civaka cîhanî ve li hember wan îdaman, weke nîşandana çirayek kesk e bi Komara Îslamî a Îranê bona îdamên pêtir.

Li gorî nûçeyên berdest li vê derheqê de li rojên Şemî û Duşemî, 1 û 3'ê Çileya Paşîn de 11 kes li bajarê Kirmaşan û Zahidanê de hatin bidarvekirin.

Herweha, li destpêka sala nû a Zayînî de jî 11 kesên Belûç bi tometên cuda li zahidanê de hatin daliqandin, 8 kesên din jî li bajarê Qumê û herweha çend roj berî niha jî çar kesên din li girtîgeha Zahidanê de hatibûn îdamkirin. Bi giştî di 13 rojên derbasbûyî de aliyê kêm 40 kes di Îranê de hatine îdamkirin û çend kesên din jî di bin hukmê îdamê de ne û pêka pêvajoya ku Komara Îslamî girtiye pêş xwe, renge hukmê wan jî bi zûyî bihê cîbicîkirin.





**Tevgera tundajo** li Kurdistanê

Ebdula Hicab

Renge ji ber xurtbûna têkoşîna tevgera neteweyî li Kurdistanê, mijara vegeşîn û pêşveçûna tevgera tundajo (radîkal) an tevgera ku...

Rûpel. 3




**Kê qazanc** dike?

Keyhan Yûsifî

Bêguman serhildana nerazîtiyan û dijberîkirin ligel desthilata zal biser her civakekê de ji aliyê tak û girûp û xelkê akinciyê wê civakê, ...

Rûpel. 4



**Çend Xalên Girîng Derbarê** Pêkanîna Jiyana hevbeş

Elwac


Pêwîstiya bi pêkanîna jiyan hevbeş di hundura her mirovekê/î de heye. Me

Rûpel.9

## Di sala 2010'an de 57 rojnamevan hatine kuştin



Li gor rapora rojnamevanên bêsînor, di sala 2010'an de bi giştî 57 rojnamevan hatine kuştin(25% ji sala 2009 kêmtir). Hejmara herî bilind li Pakistanê ye (11 rojnamevan).
51 hatine revandin
535 hatine zindanîkirin
1374 rojnamevan rastî êriş yan gefan hatine
504 sansor li wan bûye
152 bloger hatine zindanîkirin
52 bloerger êriş li ser wan çêbûye
62 welat rastî sansorkirina înternetê hatine



**Hunermend, nojdarên gelê** xwe ne

Daryûş

Hunermend hertim cehd dikin ku bi harîkariya hunera xwe hin ji êş û keserên dilê xwe kêm Rûpel. 10

www.arsivakurdi.org

# Piştevaniya PDK Îranê ji berbijarkirina Sidîq Kebûdwend

## bo wergirtina xelata Aştî a Nobelê



Birêz Sidîq Kebûdwend, çalakê siyasî û berpirsê rêxistina Mafê Mirov a Kurdistanê bi tawana berevanîkirin ji mafê mirov û rexnekirina siyasetên dijî însanî ên rejîmê li Kurdistanê û binpêkirina buhayên mirovahiyê û tepeserkirina hovane ya çalakên mafê mirov li Îranê, ji aliyê rejîma dijîazadî û mirovî a Komara Îslamî a Îranê ve çend sal e ku hatiye girtin û ji aliyê dezgehên tepeserkar ên vê rejîmê ve di îşkencegehan de bi awayek bêrehmane û dûr ji hemû yasa û rêsayên mirovî, tê azardan.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê hevdeng ligel kor û civatgehên mirovhez û xebatkarên siyasî û sivîl bo berbijarkirina navbirî bi armanca wergirtina xelata Aştiya Nobelê a sala 2011'an piştevaniyê dike.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Sekretariya**
**30-12-2010**
**9.10.1389**

## Sergotar

# Helperestî di Îraqê de

Kerîm Perwîzî

Rojnameya "Têhrani Êmroz" roja Yekşemî, 2'ê Çileya Paşîn, got û bêjek Kazimî Qumî, Balyozê berê yê Komara Îslamî li Îraqê belav kiriye ku di wir de Kazimî hin ji siyasetên Komara Îslamî li hember xelkê Îraqê, wî welatî û hêzên siyasî ên Îraqê dixe ber bas ku di cihê xwe de hêjayî baldan û dahurandinê ne û derdixe ku di wan salan de rejîma han bi çi awayan li hebmer xelkê Îraqê pîlan gêrane û di hewla wê yekê de bûye ku welatê Îraqê geşekirin û tenahiyê bi xwe ve nebîne, heya ku Komara Îslamî bigîje mebestên xwe ên qirêj.

Balyozê berê yê Komara Îslamî îtirafê bi wê yekê dike ku geşekirina pîşeyê niftê di Îraqê de û zêdebûna berhema nifta wî welatî, derbek stratîjîkî ye li berjewendiyên Komara Îslamî, lewma hewlên zaf dane ku dest biser pîşeyê niftê di Îraqê de bigrin.

Lê di hemû axaftinên wî de ya herî balkêş eve ku Kazimî di beşek ji got û bêja xwe de wê yekê eşkere dike ku rejîma Komara Îslamî di bilindtirîn asta xwe de, rewşa Îraqê weke fersendek dîtine ku dibe mifaha xwe ji wê derfetê werbigrin û desthilatek stûxwar û li bin bandor û tesîra xwe de bînin ser kar û rê nedin yên ku berjewendiyên Komara Îslamî naparêzin bihêne nav hikûmetê de.

Balyozê berê yê rejîma Wîlayeta Feqîh li Bexdayê, ji bo pasawanîn bo siyasetên Komara Îslamî di Îraqê de, di axaftinên xwe de dibêje ku hemû ew çend salane hezîneyek zaf kirine ku hikûmeta alîgirê amerîkayê nehê serkar û mafê xelkê Îraqê bihê parastin û hikûmetek xelkî be!

Ewa ku Komara îslamî hezîne û têçoyek zaf daye ku hikûmeta alîgirê Amerîkayê li Bexdayê nehê serkar û hikûmet stûxwar û guhgirê Komara îslamî be tu şik û guman têde nine, lê wate û maneya hikûmetek xelkî û mafê xelkê ji nêrîn û ramana Komara Îslamî ve balkêş û cihê heyrîmanê ye û di heman dem de henekpêkirine ku jêvaye xelkê deverê bi wan şîwazên piropagendeyên direwînî û çewaşekarane ên wê dê bihên xapandin. Di edebiyata Komara Îslamî de, xelkîbûn û hikûmeta xelkî û mafê xelkê hin peyv û destevaje ne ku bo tepeserî, tund û tûjî, givaş û kuştarên bikom û geşepêdana madeyên hişber, talan û destdirêjîkirina ser namûsa xelkê, azar û işkenceya girtiyan û .... hukmê cîhadê bi dijî Kurd û fermana kuştina bikom a girtiyên siyasî tên bikaranîn.

Bêguman Komara Îslamî di van çend salên dawiya êrîşa Amerîkayê bo ser Îraqê, hewlên zaf û hezîneyên zaf dane heya ku wêneyê îdolojiya tepeserkar, talanker û destdirêjîker a xwe di Îraq û deverê de dubare bike.

# Egera birêvebirina nehînî a hukmê îdama

## girtiyek siyasî yê kurd

Kurdistanmedia: Li gor rapora Navenda "Girtiyên Siyasî" a Îranê, li derveyî welat, pistî nîvroya roja Yeksemî, 2'ê Çileya Paşîn, hêzên îdareya Îtilaata Urmiyê, Husên Xizrî girtiyê siyasî yê kurd ji girtîgeha navendî a Urmiyê bo cihek nediyar veguhestin. Pêka pêvajoya ku rejîma Komara Îslamî girtiye pês,



egera vê yekê heye Ku hukmê Husên Xizrî jî bi nehînî birêve biçe, daku derfeta nerazîtiyê nede kesê/î. Dîvana bilind a rejîmê li dawiya meha Çiriya Pêsîn a îsal de, di nameyekê de bo taya 9' a birêveberiya hukmên dadgeha Şoreşa Urmiyê, biryra îdama Husên Xizrî ragihandibû. Eger Dadistanê Urmiyê wî hukmî pesend bike, hukmê îdama Husên Xizrî jî birêve biçe.

# TRT 6' hin gotinên kurdî qedexe dike

Karmenda kevn Rengîn Elçî diyar kir ku birêvebiriya TRT 6-ê bikaranîna 60 gotinên kurdî ku di kurdî de alternatîfa wan nîne, qedexe kiriye.
Elçî dibêje birêvebiriya TRT 6-ê bi îdîaya ku ev gotin ji aliyê Roj TV-ê tên bikaranîn, biryarek weha stendiye.

Li gora agahiyên wê , gotinên ku TRT 6-ê hatine qedexekirin ev in:
Aram, arîşe, artêş, asayî, asteng, belavok, bûyer, çalakî, dadgeh, damezrandin, darayî, derhenêr, dîmen, dîrok, dozger, ewleyî, ewlekarî, erdnîgarî, êrîş, fermî, gerdûn, girîng, helwest, hîndekar, komar, kovar, maf, merc, mijar, nakokî, navnetewî, netewe, nexşe, nijad, niqaş, nûjen, parêzger, pejirandin, perwerde, pîşesazi, pêşkeş, pêvajo, pêwîst, pirtûk, pispor, bijîşk, raman, raya gel, rexne, rêxistin, rizgarî, şano, şaredarî, tawanbarî, taybetî, têkoşîn, tenduristî, wêje, qedexe, zaningeh, zanyarî û hwd.
Herweha **gotinên weka Kurdistan û milletê kurd** jî tên sansorkirin.

# Kasibkarek li devera Selmasê hat kuştin û yekî din jî birîndar bû

Bi sedema destrêjiya hêzên Komara Îslamî, kasibkarek bi navê Îrec Mehmûdzade, canê xwe ji dest da û kesek din jî bi navê Samî Mehmûdzade bi dijwarî birîndar bû.
Nûçegihaniya Kurdistanê ragihand: hêzên Komara Îslamî a Îranê roja 1'ê Çileya Paşîn li havîngeha Quloze, ser bi "Şipîran" a Selmasê, kasibkarên gundê "Cengeser" xistin ber destrêjiyê ku di encam de Îrec Mehmûdzade hat kuştin û Samî Mehmûdzade jî bi tundî birîndarbû.
Termê Îrec piştî 24 demjimêran bi kes û karên wî hat dayîn û Samî jî bo nexweşxaneyek li bajarê Urmiyê hat şandin.

# Gefa qutkirina av, elektirîk û gazê ji xelkê gundê Nê'ê hatxwarin

Nûçegihaniya Kurdistanê ragihand, çend roj berî niha îdareya Îtilaata Merîwanê, Pêşnimêj û Şorayên gundê "Nêy" gazî kirine û gef ji wan xwarine ku divê hûn liser endamên PDKÎ zaniyariyan bidin û wan bi me bidin nasandin. Herweha gotibûn, divê di nimêja Înê de bê ragihandin ku ger karê teblîqî bo PDKÎ bê kirin, xelkê wî gundê ji av, eliktirîk û gazê dê bihên bêparkirin.

www.arsivakurdi.org

# Tevgera tundajo li Kurdistanê



**Ebdulla Hicab**

Renge ji ber xurtbûna têkoşîna tevgera neteweyî li Kurdistanê, mijara vegeşîn û pêşveçûna tevgera tundajo (radîkal) an tevgera ku bi navê dîn bi awayek pir ji tund û tîjî u binajo (fanatîk) û bi metodên dijwar kar dike, hin zêde berçav nebe. Lê nîşaneyên ber bi pêşçûna tundajoiya dînî û xwe girtina tevgera radîkale îslamî li Kurdistanê pir eşkere xuya dikin. Li derveyî Kurdistanê jî, di nava civaka Kurd de diyardeya tundajoiya dînî û kombûna lawan li devra rêkxistin û komelên tundajoye olî ber bi zêdebûnê ve ye.

Bindestiya neteweyî, belengazî û desttengî, bêkarî, serneketin di civakê de, nebûna derfeta beşdarî di birêveberî û siyasetê de, nebûna rifah û ewlekariya jiyanê, nebûna derfetên wekhev ji bo xwendin û xwepêgehandinê û astengiyên li ser riya damezirandina jiyana asayî hemû alîkarin ji bo serhildan û pêşveçûna weha tevgerekê. Lê di wan salên dawî de, pêşveçûna zimanê tund û tîjiyê, bikaranîna dezgehên ragehandin û pêwendîgirtin ji bo weşandina mesajên tund û tîjî û dijberiya siyasî li ser bingeha ol, netewe, ziman û hwd ... zemîneya pêşveçûna wê tundajoiyê zêde xweş dikin.

Aliyên hevbeşe wê tevgera nû ya tundajo li Kurdistanê, dijberiya wan bi alî û rêkxisitnên siyasiye ilmaniye Kurdistanê re, dijberiya pîvanên demokrasî û mafên mirovan, dijberiya bi mafên wekheve jin û mêran re, xurtkirina dijberiyên olî û civakî, dijminkariya eşkere bi sîstema demokrasiya lîberal re û bikar anîna metodên weke xwekujî û qurbanî kirina tak ji bo armancên siyasî ye. Ew dîtin, tevgera nû ya binajo ji hêz û aliyên dîndare din ku ev bi salane li qada siyasiye Kurdistanê dixebitin cuda dike.

Ev tevger ji xwe re damezirandina deselatek olî li ser bingeha Şerîeta Îslamî kiriye armanc û dixwaze bi riya Cîhadê ve bigehe wê armancê.

Her çend wê tevgerê carê li Rojhilata Kurdistanê nav an nasnameyek diyar nebe jî, lê li hemû bajarên Kurdistanê û li gelek gundan nîşaneya çalakiyên wê tevgerê diyarin. Mesaja serekeye wê tevgerê ewe ku li ser bingeha nêzîkbûnek binajo ji ola Îslamê ku bingeha xwe ji selefiyetê digre, deselata Şerîetê bi ser rêveberiya siyasî de serbixe û xelafetek olî ava bike. Ev tevger, nerazîbûna civakî û bindestiya neteweyî weke emraz ji bo xurtkirina bingeha xwe bikar tîne û bi wî awayî cudabûna xwe ji siyaseta neteweyî-dînî ku di wan 30 salên dawî, di çarçoveya Tevgera Xebat de beşdarî tevgera neteweyî li Rohilata Kurdistanê bû, nîşan dide. Ew tevger her wisan xwe ji wê rêbazê jî cuda dike ku piştî hatine serkar a rêjîma Komara Îslamî li Îranê di bin siya tekiye û xaneqahên girêdayî bi tevgera Muftîzade ve di çarçoveya Komara Îslamî de kar dikir.

Tevgera tundajoye olî li Kurdistanê ji ber ku xwe ji deslata şîe ya rêjîmê cuda dike, li hin herêmên Kurdistanê kariye ji xwe re ciyê pê veke û hebûna xwe biselimîne. Her çend carê ew tevger weke hêzek xwedî bandor neketibe rojeva siyasî, lê weke hêzek xwedî potansiyela pêşveçûnê di rojevê de ye û dikare di qonaxên hesas de bi awayê cidî derkeve meydanê.

Pêşîneya binajoiya dînî di çarçoveya siyasî de li bal bisilmanên Sunne dizivire dehsaliyên sêyê li sedsaliya bîstem, û dema serhildana tevgera "Birayên Bisilman" yan Îxwan al Muslimîn li sala 1928 li Misrê. Armanca Hesen Al Benna li damezirandina tevgera Îxwan li Misrê ew bû ku bi riya şiyariya dînî ve, rewşa siyasiye civakê biguhere û newekhevî û bêedaletiya civakî bi dawî bîne.

Tevgera Îxwan di destpêka xwe de alîgirê tund û tîjî an bikaranîna zorê ji bo bidestxistina armancên siyasî nebû, lê piştre dema ku Seyîd Qutb (1906-66) weke îdeoloj û birêveberê tevgerê hate pêş, hizra Cîhad û damezirandina deselata Îslamî li cîhanê kete rojeva tevgerê.

Çiqên tevgerê li welatên dine bisilman di dema şerê cîhaniyê duyê hatin damezirandin, sala 1941 tevgera Cemaetê Îslamî li Hind-Pakistanê hate damezirandin u pişt re zêdetir pel veda û piraniya deverên başûrê Asiya girt. Lê wê tevgerê li Kurdistanê pêşketinek wisan bi dest nexist û nekarî bi rêkxistin bibe. Ji ber ku wê demê pêşnegên olî li Kurdistanê, ketin bin karîgeriya tevgera neteweyî û li bin ala tevgera siyasiye Kurdistanê, mijara mafên demokratîk û neteweyî xistin rojeva xwe û civakê.

Şerê Efxanistanê li dawiya salên 1970, rewşa tevgera binajoye îslamî li Rojhilata Navîn û li Kurdistanê jî guherî. Li seranserî herêmê, alîgirên "Cihadê" berê xwe dan Efxanistanê û bi piştgirî û alîkariya darayî û teknolojiya Amerîka li şerê li dijî Yêkitiya Sovyet de beşdar bûn. Ji Kuridstanê re jî bi taybet li Başûr û Rojhelatê Kurdistanê ve be dehan kes çûn Efxanistan û Pakistanê heya ku tevlî wê tevgerê bibin.

Piştî serketina tevgera Mucahidîn li Efxanistanê, wan şervanên cihadkare Kurd berê xwe dan Kurdistanê û wê carê li welatê xwe rêkxistinên tundajo ava kirin. Sala 1987 yekem tevgera cehadî ya Kurdistanê, bi navê "Bizûtnewey Îslamî le Kurdistan" li Îranê bi rêberiay mela Osman Abdul Azîz hate damezirandin heya ku li Başûrê Kurdistanê û li Îraqê kar bike. Ew tevger pişt re ji hev cuda bû û balê tundajo bi navê Ensar Al Îslam bi serokatiya Mela Kirêkar kete dijberiya deselata Kurdî. Ew yek di serî de ji bo hêzên neteweyî-oliye Kurd û piştre jî ji hemû tevgera Kurd re bûyerek nû û çaverê nekirî bû. Ji ber ku ew li hêviyê nebûn ku cihadkarên Kurd, carek ji caran vegerin Kurdistanê û ji siyaseta demokratîk û lîberale hêzên Kurd re bibin gef.

Tevgera tundajo ya olî li Rojhilata Kurdistanê di gel ku li ser heman bingeha hizrî ya Bizûtnewey Îsamî hatibe damezirandin, lê tu nîşaneyên hindê nînin ku girêdana rêkxistinî bi wê tevgerê re hebe. Ew jî wê metirsiyê zêde dike ku ew tevgera bê adres pitir ber bi tundajoiyê ve here û di dawiyê de hem ji bo heremê û hem jî ji tevgera neteweiye Kurdisatenê re bibe pirsgirêkek cidî. Ji ber ku zemîneya xurtbûn û pêşveçûna tevgera radîkale Îslamî li Rojhilatê Kurdistanê heye.

Çalakiyên ku tevgera tundajo ya Îslamî li Rojhilata Kurdistanê dimeşînin, ji pir aliyan ve weke destpêka xwegirtina wê tevgerê li welatên weke Efxanistan, Somalî, tevgera welat nenase Al Qaide û tundajoiya Îslamî di civakên bisilman de ye. Ew bi riya çalakiyên xêrxwazî û bi navê şiyarkirina olî dikevin nava civakê, lê dema xwe bihêz kirin û têra xwe kesên amadeyî xwekujiyê amade kirin, dikevin çalalkiyan.

Ev demeke ku nîşaneyên çalakiya wê tevgerê li Rojhilata Kurdistanê zêde bûne. Ev tevger, ji ber cewhera xwe ya dij demokrasî û wekheviyê, rêbaza ku ji bo bidestxistina deselata siyasî bikar tîne û şêweya karê xwe, heta eger bê û ji mafên neteweiyê gelê Kurd jî xwedî derkeve, ji bo pêşeroja gelê Kurd metirisyek mezin e. Lewma xurtbûn û pêşveçûna wê tevgerê ji hemû hêzên siyasiye Kurd re sîgnalek bi metirsiye ku pêwîste bi cidî were girtin û di hember de rê û rêbazên pêwîst werin danîn.



www.arsivakurd.org

Hejmar 150, 6'ê Çileya Paşîn a 2011

# Demokrasî

N: Şehriyar Zerşinas
W: Siyamend

Beşa 1

Cehd û bizav, bona bidestveanîna sîstemekî siyasî a armancxwaz, ji mêj dem e bîr û hizra mirovan bi xwe ve mijûl kiriye. Yûnaniyên kevnar yekem kes bûn ku pêdvîbûna destpêragehiştin bi hikûmetek siyasî a jêhat ji bo jiyana mırovan dane eyankirin. Pirsyarek ku ji wan re derket holî, eva bû ku kîjan nizama siyasî û kîjan awayê hikûmetê, herî baş û jêhat e? Ev pirsa han ya li berçav hêsan û sade, wek pirsyarên herî sereke yên tev felsefeyên siyasî di pêvajoya dîrokê de xwe derxist holê .

Herê gelo em dikaribin bêjin îro wate di destpêka Sedsala 21'an de, lêgerîn û berhevdana mirovatiyê bona peydakirina bersiveke bicih ji bo pirsyara han, serkevtî bûye ? Bona berhevdana zaftir a wê mijarê, dibe bêjin ku li her ciheke ku mirov bi ser mirovan de desthilat û hakimiyetê dikin – wate bikiryar di tev nîzamên siyasî-pirsyara berheqî a wê desthilatê, wek pirseke bingehîn xwe derdixe holê.

Bi erxayînî dikaribin bêjin ku demokrasî an xelkserwerî, tenê nizama siyasî a heyî di cîhanê de ye ku bersiveke baş bi pirsyara berheqî û meşroiyeta deselatê dide. her bi vê sedemê herçend ev şêwaza hikûmetî, tenê di kêm welatên cîhanê de hatiye cihgîrkirin, lê mîna sembol û mînakekî baş bona îdarekirina welat, bi avayekî berfireh cihê xwe di bîr û raya giştî a cîhanê de vedike. Kêm ninin ew welatên ku di cîhanê de îro zêdebarê dijwarî û astengên di biyavên siyasî, aborî û Civakî, di pêxema gihîştin bi demokrasiyê cehdê dikin. Ji hêlek dinê, tu hukûmeteke siyasî û heta rejîmên herî reş ên kedxarî û dîktatorî di cihanê de peyda nabin




ku xwe nizamekî nedemokratîk xwe dinasînin. Herê gelo ew yeke nîşan û berjenga rastiya demokrasiyê nine?
Diyare ewa bi vê wateyê nine ku demokrasî nizameke bê kêmasî û îrad e. Tiştek asayî ye ku heya îro hikûmet û nizamên siyasî yên demokratîk jî nekarîne bersivek tewaw bi tev arîşe û pirsgirêkên civatgeha mirovatiyê û nemaze ya ku peywendî bi dada civakî ve heye, bidin. Lê dibe di navbera rejîmeke siyasî a armancxwaz û îdeal û rejîma herî baş a siyasî cudahî were danîn. Wate ewa ku dibe hebe û ewa ku birastî bi awayê herî baş heye .

Zêdebarê pirsgirêk û arîşeyên peywendîdar bi parvekirinên madî, îmkana mifahvergitina xirab ji hêz û desthilatê di tev nizamên siyasî û ji vana di demokrasiyê de heye . Lê dibe ev yeka were berçavgirtin ku demokrasî tenê nizamek e ku bi berçavgirtina hin rêkar û mîkanîzmên xasmanî di birêvebirna kar û barên welat, bona berahîgirtin ji gendeliyan, kiryarên micid birêve birine. Ew rêkar û mîkanîzmên han kîjanin? Hêz û desthilatê di xwe de meşîna ber bi zêdebûn û kocîbûnê heye. Rewişt û xwasteka her dewletekê, berfirehkirina kewşenê desthilatê di hundir û dervede ye. Her bi vê sedemê, desthilat hertim pêdvî bi zêrevanî û diyarîkirina sînoran e. Sînorên tev dewlet û hikûmetan, di vir de ye ku digel kesayetî û hurmeta mirovan serederiyê dikin. Tiştekî han bi neçarî peywendiyeke pir arîşe di navbera mafên mirovan û şêwaza rêkxistina dewletê pêk tîne.
Lewra nerast nine ger em bêjin ku pirsgirêk û arîşeya herî sereke a nizameke siyas a demokratîk, rêkxistina bi aqilane ya peywendiya pirr aloz a navbera azadiya welat digel civak û dewletê ye.

Rêkar û mîkanîzmên ku demokrasiyê ji bo armancekî han berçav digre, curbicur in û wek pîvan û miiyarên avakerên wê tên hesibandin. Pîvan û bingehên herî girîng ên demokrasiyê ji eslên jêrîn pêk tên :

- Berçavgirtina hurmeta mirovan û mafên mirov wek bihayeke bingehîn.
- Pejirandina fireçeşnî an piloralism û zelalî wek bingehekî pêdivî ji bo civatgehê.
- Desthilata xelkê di riya beşdariya siyasî a wan di kar û baran, danîn û berheqîdan bi binyatên desthilatê.
- Bersivderbûna binyatên desthilatê li hember xelkê de.
- Azadiya partî û saziyên civatan wek berjenga teverên birêvebirina îradeya sîyasî a xelkê û îmkana pêkanîna altirnativ ji bo hikûmetê.
- Azadiya Ramanê, derbirîn û qelem, wek berjenga geşekirina jiyana demokratîk a civakê.
- Parvekirina hêz û dezgehên Dewletî bi armanca tewerekê ji bo garantîkirina azadî û zêrevaniya desthilatê.
- Hikûmeta yasayê, vate wek hêviya hemûyan li hember yasayê û berçavgirtina wê ji aliyê tev binyatên hikûmetî û hevwelatiyan.
- Hebûna zelaliyetê di biyavê siyaseta derekî ji bo rêkxistina peywendiyeke eqlanî ligel dewletên cîhanê di asta navnetewî de.

Em dikarin bêjin ku ew eslane mîna wan Kerpûçan tên hesibandin ku avahiya demokrasiyê ava dikin.

Di beşên din de her yek ji wan eslan dê bihên şirovekirin.

# Kê qazanc dike?



Keyhan yûsifî

Bêguman serhildana nerazîtiyan û dijberîkirin ligel desthilata zal biser her civakekê de ji aliyê tak û girûp û xelkê akinciyê wê civakê, dijkiryarek e li hember kiryar û riftarên nehêja ên desthilatê li hember wan.

Pêkhatiya desthilata zal mêtod û şîweyên xistineber basa van nerazîtiyan yan wan daxwazan diyarî dike. Mirov ji bo gihîştin bi maf û daxwazên xwe, hertim rê û şîwazên herî sivik hildibijêrin ku kêmtirîn nirx ji wan re hebe. Wate şîweyên got û bêj û daxwazên bi awayê medeniyane û demokratîk. Lê naveroka hin ji desthilatan ligel vê cura daxwazan hevaheng nine seba çawaniya hişkiya desthilat û serberedayiya karbidestên vê sîstemê, xistne ber basa her cure daxwazek rewa dibe tawan û bi tundtirîn û hovanetirîn şîwe tên bersivdan.



Teqîna roja Çarşemî 24' ê Sermawezê li bajarê Çabehar. (devera Beloçistanê), dîsan bû sedema kuştina 39 kesan û birîndarbûna dehan kesên din ku pirraniya wan jin û zarok û xelkê bêguneh bûn. Akama wiha kiryarekê û bikaranîna van metodan, karek rewa nine û ji xwe re mehkûm e. Lê pirsa girîng ku dibe sedem ku mirov pêtir li ser bisekine, ew kiryar û riftarin ên ku rê liber wiha karesatan xweş dikin.

Qazanca wiha kiryarekê bo kê vedigere? Xelik? Girûpên dijber ên ku wan kiryaran encam didin? Yan desthilata Komara Îslamî? Di her

Dom: Rûpela 5

haletekê de bêguman qazancê van kiryarên vedigere bo desthilata sereberdayî. Girûpên dijber bi encamdana kiryaran wiha, riya bidestxistina du armancan dişopînin. Yekim: neçarkirina desthilata navendî bo danpêdana bi daxwazên wan û misogerkirina wan xwastan.

Duyem: weke alavekê ji wan kiryaran mifahê distînin bo nasandina xwe bi xelk, dever, welatên cîhanê û navnetewîkirina pirs û xwastikên xwe, ku eva jî her di pêxema bidestxistina xwastikên benda yekim e.

Lê kiryarên wiha rêxweşkerin bo bikaranîna tund û tûjiya pêtir ji aliyê dezgehên tepeserkar ên desthilatê ve û rê dide desthilatê ku bi heza xwe pêtir çalakên çandî û sîvîl bi hêceta peywendî ligel rûdana wan bûyeran destbiser bike û lidarve bike.

Rejîma Komara Îslamî bi taybetî û hemû desthilatên serberedayî û hov bi giştî, nehez û dijberên xwe bi terorîst sûçdar dikin ku weha rewayiyekê çi li navxweye welat û çi di asta navdewletî de dide kiryarên tepeserkarane ên rejîmê.

Rejîmê bi hilgirtina mafê parastina rewa, hovane û bi awayên nemirovane dikeve qirkirina dijber û neyarên xwe û xelkê bêtawan, herweha lisêdaredana 11 çalakên girtî ên Belûç piştî wê bûyerê mînakek ji cînayetên dezgehên terorê ên dewleta Komara Îslamî bûn.



Lê tiştek ku ji helwestên vê dawiyê ên karbidestên rejîmê bi nîsbet helwestên berê ên wê di peywendî ligel wiha bûyerekê de cuda bû, tometbarkirina Erebistana Seûdî û Pakistan bû. Xincî Amerîka, Birîtaniya û Îsraîlê ku berdewam weke bikerên wan bûyeran ji aliyê karbidestên rejîmê ve bibê tu fakterek dihatin tometbarkirin, wê carê Erebistan û Pakistan jî çûne rêza tawanbaran, heya qasekê ku Seyîd Hesen Neqewî, endamê Komîsyona Ewlehiya Netewî dibêje: "li gor hin zanyariyên bi belge, saziya sipaya Pakistanê rasterast di perwerde û elimandina terorîstan de rol dilîze û ...".

Eva jî taktîka eşkere ya rejîmê her di destpêka pawankirina desthilatê ve heya niha bûye, veguhestina sedemên bûyeran bo dervey welat, girêdayîbûna bikerên wan kiryaran û herweha opozîsyona rejîmê bi welatên biyanî û ji wana Amerîka, Brîtanya û Îsraîl, ku bi vî awayî dixwaze berpirsayetiya wan bûyeran liser milên xwe dûr bixe, lê ya rastî ev e ku ewa kiryarên nekêr û serberedayî ên rejîmê ne ku wiha karesatekê diafirîne. Rejîmek ku biçûktirîn dengê cuda difetisîne û xincî boçûna xwe a hişk tu bîr û hizrînek din napejirîne û di rastî de, eve rejîm e ku dibe sebeb û afirînerê cudahî, newekhevî, zulm, givaş û ew seqaya reş û berteng a civaka Îranê ye ku girûpên wiha neçar dike ku dest bo teqîn û xwe teqandinê bibin. Her weke me got ku girtin pêşa wiha metodekê de xwe di xwe de mehkûm e, lê çavkaniya sereke, rejîmek e ku bo mana xwe heta rehm û gunehê bi halê xelkê bêtawan de jî nahê û bixwe afirînerê karesatênwiha ye.

# Rêberên Komara Îslamî a Îranê ji encama ragehandina dadgeha Herîrî nigeran in



Dara Natiq

Pirsa Dadgeha Navneteweyî a pêregehîştin bi perwendeya terora Refîq Herîrî Serokwezîrê berê yê Lubnanê, di heyamên çend salên derbasbûyî de bûye cihê bas û gengeşeyek zaf di nava part û aliyên siyasî yên Lubnanê û zaf caran ew welate heya qasê alozî û şer û pewçûnên navxweyî jîbirye. Piştî terora Herîrî, piraniya welatên cîhanê û nemaze Komîsyona peyda kirina rastiyan "Heqîqetyab" ku ji aliyê sazya Netewên Hevgirtî ve bo vekolîn ji perwendeya terora navbirî hatibû pêk anîn, Hizbullah û dewleta Sûriyê bi pilandarêj û encamderê sereke yê vê terorê nav bird.

Encama biryara Komîsyona peyda kirina rastiyan bûye hegera pejrandina biryarnameyekê ji aliyê Şêvra Tenahiyê ve ku li gor wê çendê Dadgeha Navneteweyî a Laha li sala 2007'an şûnde de pirsa vekolîn û pêdeçûn kirin bi perwendeya navbirî girte sitûyê xwe. hemen dadgehê di çend rojên derbasbûyî de ragehand ku di heyamek nizîk de ew yê encama vekolîna vê perwendeyê bi raya giştî re bidin eşkere kirin, ku wisan dixuye Hizbullah bi tawanbarê sereke yê vê terore bihê naskirin. Pirsa han bûye sedema vê çendê ku rêberên Hizbullahê niha de li xwe ketine û gefan dikin û dijkiryarên tund ji xwe nişan didin. Hesen Nesrullahê serokê vê partiyê ragehand ku dadgeha han dixwaze ku di bin zext û bandora alîgirên dewleta Îsraîlê de prek ji rayedarên partiya me tawanbar bike, nabirî herwisan got ku di encama derçûna biryarek han de ji aliyê dadgehê ve, ew yê dijkiryarên tund ji xwe nîşan bidin. Ew axaftinên serokê Hizbulahê bûye cihê nigeraniya raya giştî û nemaze welatên herêmê û aliyên siyasiye Lubnanê.

Ji aliyekî din we Xamineyî rêberê Komara Îslamî a Îranê, ji helwestên xwe yên dawî di vê derheqê de ragehand ku dadgeha pêregehîştin bi perwendeya terora Rfîq Herîrî tiştekî teşrîfatiyê û dûre ji dadperweriyê û Îran bi tu awayî encama biryara wê dadgehê napejrîne. Xamineyî di demekê de vê gotinan dibêje ku Hizbulah ji hêla siyasî, abûrî û nîzamî ve ji aliyê Îranê we piştgîrî jê tê kirin û sûçdar bûna Hizbulahê di vê derheqê de komek gomanan li ser Îranê çê dike. Ev helwêstên Xamineyî bûye cihê nigeraniya welatên herêmê bi giştî û Lubnanê bi taybetî ji berku Îran bi wan helwestên xwe weke destêwerdan di kar û barê welatên cîran de tê sûçdar kirin. Xamineyî niha de dixwaze bi wan helwestên xwe gumanan li ser encama dawî biryara dadgeha Laha çê bike û bi handana Hizbulahê zemîneya şerekî hundrî di Lubnanê de berhev bike ku bibe hegera têkdan û aloztir kirina tenahiya herêmê.

Nivbirî di demekê de bas ji bêedaletiya dadgeha Laha dike ku henoke bi sedan xwandekar û xebatkarên azadîxwaze Îranê di zîndanên wî welatî de tên eşkence kirin û di dadgehên nizamî û çend xulekî de sizayên herî giran bi ser wan de tên sepandin û nemaze beşek berçav ji wan tên darwekirin. Ji aliyekî din we bi dehan xurtên azadîxwaz û şoreşvan di zîndana Kehrîzek a bajarê Tehranê de bi avayên hovane û dûr ji rewişt û wîjdana mirovahiyê ji aliyê karbidestên Komara Îslamî a Îranê we destrêjiyên cinsî ji wan hatiye kirin û bêrehmane eşkence hatine kirin û niha ji her ew kiryar didomin. Xelkê Îranê di bin zulm, tepeserkirin û bêdadiyê de jiyana xwe didomînin û rewş û zirûfa polîsî û emniyetî per û baskên xwe bi ser welêt de kêşaye û her dengekî azadîxwazî di wî welatî de bi avayekî tund tên xendiqandin.



www.parsiwakurdi.org



# Hindik hindik, xurek dê bibe pelûqundik



Cefer Mubeşirniya

Piştî heyamek dûr û dirêj û gîrobûnek zaf, di encam de armancdarkirina yaraneyan hat sepandin û ket qonaxa birêvebirinê.

Pêka zaniyriyan di rojên destpêka birêveçûna terhê dujminkarane yê han de rejîma Komara Îslamî, pir zû bandora xwe ya nerênî xist ser jiyana xelkê û tevlîhevbûna rewşa jiyanê û hêrsbûna xelkê ji desthilatdarên rejîmê gihîştiye ser hestiyan. Lê ew çareyeşî û hêrsbûna xelkê, heya niha nebûye dijkiryarek giştî a weke xelkê welatan ên ku li hember biryarek nekêr a hikûmeta xwe de dest davêjin xwenîşandanan û bi yek deng cîhanê ji şaşiya desthilatdarên welatê xwe haydar dikin û bi daxwazên xwe ên rewa desthilatdarên hikûmeta xwe ji biryara şaş paşde dizivirînin.

Ewa jî vedigere ser vê yekê ku xelkê Îranê ji hovîtî û nemiroviya desthilatdarên Komara Îsamî tu guman ninin û dizanin ku li hember her cure meş û nerazîbûnek, xwînxwarên rejîma melayan dê weke hercar dest bavêjin girtin, kuştin û îşkenceya neraziyan.

Lewma giraniya li radebider û çavdêriya tund û mîlîtarîzekirina welat ji aliyê rejîmê ve kar ji derûna xelkê kiriye û li her derek welat ewlehiyî nemaye. Li gor zanyariyên ku di malperên Înternetê de dikevin berçav, xelik hêrs û esebî û daxdar e û rojane li bazaran, sefên nan, nobeya benzîn û riyên hat û çûyê de pirsgirêk û arîşeyên nexweş û kirêt ên weke şer û pevçûn di navbera xelkê de diqewimin û bi wî awayî kela daxa ku rejîmê li dilê wan daye, biser hev de dirêjin.

Wan desthilatdarên talanker rewşa jiyanê wiha lêkiriye ku di sedsala 21'an de li Îrana dewlemend û xwedî çand û abûriyek bihêz, bi sedema birêveçûna terhê jiholêrakirina yaraneyan û destpêkirina giraniyek çendqat, bi neçarî xelkê rû kiriye jiyanek destpêkî.

Bo mînak li pirraniya deverên Îranê, xelkê şiyana kirîna nift û gazê bi nirxek çendqatî ninin û di vê zivistana bi sir û seqem de bo gerimkirina malên xwe rû kirine sobeyên rejoyê yan jî sobeyên daran û dest bi komkirina dar û qirşikan kirine. Ewa jî rewşa jiyanekê ye ku di destpêka sedsalên 20'an de bidawî hatibû. Her seba giraniya şevatê, xelkê turumbêlên xwe sekinandine û bo hat û çûnê mifahê ji matorgazî û payskilan werdigrin, diyare di halekê de ku nirxa kirîna wan du alavên hat û çûyê jî çend qat bûye.

Giraniya şevatê kar li gişt aliyên jiyana xelkê kiriye. Karxane û kûrexaneyan demjimêrên karê xwe kêm kirine û berhemên xwe kêm dikin û ev yeka jî bûye sedem ku alavên pêwîste jiyanê ên ku di karxaneyên navxwe ên welat de dihatin bikaranîn, dest nakevin yan jî nirxa kirîna wan xeyalî ye. karmend û kedkarên karxaneyan tên derxistin û bêkarî çendqat jorde çûye. Heqê elektirîkê bi qasekê ye ku kargehan mifahsitandin jê ragirtine û pirraniya karên xwe bi destî dikin. Mifahsitandin ji alavên elektirîkî ên nav malan de hatiye sekinandin û bi giştî jiyana bajêrvanî ketiye qonaxek destpêkî de.

**Jiyana gundan jî li vê çareyeşiyê bêpar nine.**

Jiyana gundan jî ku girêdayî bi pezdarî û werzêriyê û beşek wan jî di riya kasibkariya ser sînoran e, ji wan 3 pîşeyên jiyanê re jî dîsan giraniya şevatê rolê xwe yê nerênî dilîze, dema ku xuyaye bijîva pirraniya kasibkarên ser sînor di riya kirîn û firotina şevatê de dabîn dibe, tê zanîn ku piştî birêveçûna wî terhî nirxa şevatê li Îranê de ligel welatên cîran wekhev e û ew riya derxistina bijîva jiyana gundiyan jî hat daxistin.

Ji aliyek din jî bo pîşeyên weke pezdarî û werzêriyê jî hewcehî bi hin alavên taybet bi wî warî heye bi taybetî "tiraktûr" pirraniya karê werzêrî pê tê encmdan, lê wê jî pêwîstî bi mesrefek zaf a gazoîlê heye, ger karê rojane yê alavê tiraktorekê ligel berhema wê bihê berhevdan, di rastî de qazanc serê mawe (maye)dixwe.

Meseleyek din ku ji her tiştek girîngtir e, mesela destnekevtin û giraniya nan e ku di Îranê de mesrefek zaf heye û tu tiştek din jî nikare cihê nan bigre. Piştî birêveçûna terhê armancdarkirina yaraneyan, him nirxa nan pirr jorde çûye, him jî naxane seba destnekevtin û giraniya şevatê bi neçarî hin nan dikin, ewa jî bûye sedem ku xelik sefên dûr û dirêj ber deriyê naniwaxaneyan girê bidin û ji demjimêrek heya du demjimêran di sefên nan de bisekinin.

Ewane û çendîn pirsên din ên girîng berhemên terhê Ehmedînijad in ku ger pereyê mehane yê ku bi gotina Ehmedînijad -ewa pereyê Îmamê Zeman e û nabe tevlî pereyên xwe bikin", ku tenê 47 hezar Tûmen e bihê dabeşkirin bo pêdawîstiyên jiyanê, bi tu avayekê têra xerca heftiyekê nake. Bi wê rewşê û bi wî halî û bi wan terhên Komara Îslamî -bi piştevaniya Îmamê Zeman-, herweha di civakek ku 30 ji sedî a wê bengdar û moitad bi madeyên hişber e bêguman ji wan 30% xelkê motad re girîng nine ku mal gerim be yan ne, zarokên wan di mala xwe de şîva şevê hebin yan ne, belkî pereyek kim mehane bihê destê wan û bidin hin madeyên hişber û bikşînin. Welî Feqîh û dardestên wî jî bi wan re pirr heval in, eşkere ye ku em dê hin dengên piştevan ji wî terhî re jî bibihîzin.

lewma ger wiha here pêş, hindik hindik, xurek dê bibe pelûqundik. Meger yekdengiya xelkê bi piştevaniya hêzên opozîsyonê bi hevre dest bidin destên hev û rejîma fesad û xwînmija Komara Îslamî û terhên malwêranker ên wan bi hevre bikin kevirê bin gomê.



Hejmar 150, 6'ê Çileya Paşîn a 2011

# Îmkana Şerek Giran Di Rojhilata Navîn De

Rojnameya Elqudsa Erebî a ku li Birîtanya tê veşandin ragihand: Birîtanyayê daxwaza vegeryana gişt hevwelatiyên xwe ên ku di welatên Xelîca Fars de mijûlê siyahet yan çalakiyên abûrî bûn kirin. Ev kiryara Birîtanyayê seba zêdebûna îmkana şerek teze di navçeya Rojhilata Navîn de ye.

Ebdulbarî Etwan birêveberê rojnameya han di beşa gotina birêveber a rojnameya Elquds de amaje bi vê yekê kiriye ku, berî rûdana şerê Îraqê jî em şahidê kiryarek wiha ji aliyê welatên rojava ve bûn.

Navbirî ragihand: Biryarên welatên Ewropî bi taybetî Birîtanya bêsedem û bingeh ninin. Belkî biryarên han li gor zanyariyên dirus û piştperde tên dayîn, ku em dikarin pêka wan biryar û kiryaran bigîjin encamekê.

Wî li zarê rojnameya "Dîlî Telgiraf" ê got ku hevkariyên nîzamî di navbera welatên Erebî ên herêma Xelîca Fars û Birîtanyayê zêde bûne û heweha liser daxwaza welatên erebî ji Rojavayê bo tevlîhevkirina bingehên navkî ên Îranê ku ji aliyê Wîkîlîksê ve hatine eşkerekirin pêdagirî kir.

Di beşek din a wê nivîsê de hatiye ku Amerîka welatên Erebî bi mûşekên "patriyot" pirrçek kirine heya di şerek ku îmkana wê zaf e berevaniyê ji xwe bikin.
Di dawiyê de ragihandiye ku hemû welat di seba bikaranîna cura çekan di wî şerî de beşdar dibin û ew şer dê ligel şerên din cudahî hebe.

# Pêşmerge dê beşdarî rahênana NATOyê bibin



**Hat ragihandin ku Pêşmergeyên Zêrevanî ên Herêma Kurdistanê wek beşek ji polîsê federal yê Iraqê, dê beşdarî dewreyên rahênanê yên hêzên NATO'yê bibin.**

Fermandarê Pêşmergeyên Zêrevaniyê Ezîz Weysî tevî piştrastkirina vê nûçeyê di vê derbarê de, got: "Piştî ku biryar hat dayîn hêzên berevanî û zêrevanên herêmê bibine beşek ji polîsê federal yê Iraqê, ew hêz dê beşdarî dewreyên rahênana hêzên NATOyê bibin. Dewreyên NATOyê dê dom bikin."

Li gor nûçeya Ajansa Nûçeyan a Kurdistanê Weysî axaftina xwe wiha domand, "Li gorî rêkeftina navbera me û wê Wezaretê, bo her dewreyekê hejmarek berçav ji zêrevanên me beşdar dibin û bi awayekî akademîk û pêşketî tên rahênan da ku bibine beşek ji polîsê federal. Mesrefên wan dewreyan jî dê li erkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê bin."

Malpera "War On Terror" ya navneteweyî, nûçeyek belav kiribû ku hejmarek ji polîsê Iraqê û pêşmergên zêrevanî ji aliyê hêzên NATOyê ve li paytexta Îrlandayê Dublinê, hatin rahênan.

## "Kirak" yekimîn madeya hişber e ku ciwanên Tehranî bikar tînin

Wezîrê navxweyî yê Îranê ragihand, piştî "Kirak", "Şûşe" û "Tiryak" e ku ciwanên Tehranî bi kartînin. Mistefa Mihemednecar, herweha yek ji sedemên bi karanîna madeyên hişber xiste stûyê berpirsên qotabxaneyan û got dana zaniyariyên şaş bi qutabiyan bûye sedema balkêşiya ciwanan berbi madeyên hişber.

Rojev

# Komara Îslamî ber bi Kirsdanka dîrokê ve dimeşe

W: Arîn

Ray Takiye, lêkolînerê payebilind yê Şêvra pêwendiyên Amerîkayê li rojnameya Niyoyork Taymz'ê de babetek bi navê "Komara Îslamî ber bi kirsdanka dîrokê ve dimeşe"weşandiye ku li jêr de emê beşek ji wê bixin berçavê we hêjayan.

Ew li destpêkê de basa serketina tevgera azadîxwazî û nerazî a hundirî welat dike ku valabûna sîstemê bi başî da xuyakirin û nîşan da ku ew sîstem ne ji usûlên îlahî, pîroz û teberik berevaniyê nake, belkî ji mêrên tirsonek, bêrehm û hov pêkhatiye ku ji ber îtiyad û bengdariya bi desthilatê her tişt gorî dikin.

**Xebat û tekoşîn ji bo Îranek nû**

Îro rojê Komara Îslamî li pileya yekem de balê dikişîne ser xebat û tekoşîna navikî a xwe. Bi vî halî, di bin tîrojkên tûj yên civîn û rûniştinên bêencam û îdiayên zor derheq şiyanên aborî, pirsiyarek girîng hêj li holê de ye. Gelo hikûmeta nawendî a Îranê dê çiqas bijît?

Li dîtingeha pir kesan li Waşîngtonê de tevgera Kesk a dijberî hikûmetê, bîranînek çirmisî ye ji pêlên nerazîbûna li dor lîstika binav hilbijartinê ku hikûmeta Îslamî ger em nebêjin ew jinav bir, aliyê kêm ber bi mandîbûn û westiyanê ve kişand. Lê hestek han ji kewil ve derbasî kûrahiyê nabe heya ku bigihîje pirsiyarek bingehîtir; eva ku li welatek bi sîstemek wiha hov de, tevgera kesk çiqas tab kiriye.
Komara Îslamî hikûmetek dîktatorî a asayî nine, belkî îdeolojîkî ye û ji vê dîtingehê ve jî wêrantir ji dîktatoriyên din.

Hikûmetên wusa ji bo tocîh û selimandina tepeseriyan û desttêwerdanên ji derve hewcehî bi şiroveyên bêesas, hêcet û sedemên neaqilane hene.

Berpirsiyarên mesebî yên dewletê, renge dest bidin tund û tûjiyê, lê ew karê wan qirar e ku ji bo pêşvebirina armancekê li dîrokê û ji bo bicihhatina hin armancên bilind û pîroz bihê encam dayîn.

Ray Takiye îşare bi gotinek Muntezirî li meseleya tepeserkirina hovane piştî hilbijartina sala 2009'an dike ku gotibû: "Komara Îslamî divê bisekine û teklîf û çarenivîsa xwe rohn bike ku gelo komarî ye yan Îslamî".

Lewma ew bawer e ku xeter demekê gefê ji desthilatdaran dixwe ku hejmarek zaf û berbiçav û bi tesîr ji vê qata desthilatdaran bawer bikin ku desthilat bi neheqî li destên wan de ye.

Ji binav hilbijartina gera 10'mîn ve, tim pêlek ji bijardeyan, ji mîratên înqilabî yên dev berdane û ji hikûmetekê veqetiyane ku serdemekê bi xwe jî berevanî jê kirine. Bi tengtir bûna girovera desthilatê, hakimên Komara Îslamî xwe her roj zêdetir dixin cihê rêberên Yekêtiya Soviyetê a berê. Wan ku koşkên xwe ji riya teror û hovêtiyê çêkirine, li bin siya berpalên ji kuştiyan, bi xeyala xwe aram û tenah pal dabûn, lê tenahiyek ku xuya bû çiqas neewle, bêbawer û nepaydar e.

Herçiqas ku tîş, verîn û kirmîbûn ji Komara Îslamî re pitir diyar dibe, rejîm jî berbirûbûna bi neraziyan re bi awayên tund didomîne. Armanca sereke ya her dîktatoriyekê eve ku civaka xwe gorî îmkan bi biçûktirîn beşan parve bike û takên civakê, kit kit, tenê û xemgîn li nav bername û pilana zulm û stema xwe de qifil bike(girê bide), lê teknolojiya sedsala 21'an li rizandina îdiayên hikûmetê de rolek mezin lîst.

Herweha hin ji ragihandinan jî piştevaniyê ji melayên hakim li Îranê de dikin û çarçoveya hêrs û nerazîbûna xelkê berfirehtir dikin. Lewma berdewamiya dijberiyê, dê teisîr û bandorek wêranker hebe, hikûmetek ku xwe bi kirîza rewatî û meşrûîyetê re dibîne ku nahê qerebûkirin û xebatek e ku nahê temirandin.

Bizava nerazîbûna li hundirê Îranê de deskewtên zaf bidest xistin, karî şeqarê bixe nav sîstemê û zêdetir li dijî rejîmê pêlan bawêje.

Ray Takiye di doma gotara xwe de diniwîsîne herçiqas ku Komara Îslamî rû ji kirsdanka dîrokê kiriye, lê hêj pêşeroja Îranê dê ji kêşe û pirsgirêkan dûr nebe. Herweha renge piştî nemana rejîmê, bo heyamek dirêj jî Îran aramî û asayîşê bi xwe nebîne. Lê dîsan jî Amerîka û hevalbend bi nîsbet pêşeroja Îranê xemsar nabin, ji ber ku Ronald Reygan serbarê wê ku ji hiloşîna Yekêtiya Soviyet erxayîn û xatircem bû, lê girêbenda kuntirola sîlahan bi şorewiyê re wajo kir.
Destgihîştin bi armancên girîng yên ewlehî nebû sedem ku Reygan ji tevgera hevbendiyê li Lehistanê de pêşwaziyê neke, yan ji girûpên siyasî û dijberî rejîma pawanxwaz li seranserê Ewropaya

Rojhilat de bêhay û dûr bikewe. Lewma Amerîka ji piştewaniya wan kesan ku pêşerojek geştir ji bo Îranê çavnihêr dikin, dê sergerdan nemîne.

**irandarjahan.net**

# Destegula Mihemed



Mihemed li hember gulfiroşiyekê sekinîbû û dixwast deste gulek ji bo diya xwe ku li bajarek din dijiya, bikre û jêre bişîne.

Dema ji gulfiroşiyê derket, çavê wî ket keçekê ku li kêleka şeqamê rûniştibû û digiriya. Mihemed xwe nêzîkê keçê kir û jê pirsî: “Keça baş tu çima digirî?”

Keçika biçûk li halekê ku digiriya, got: “Min dixwast ji bo diya xwe deste gulek roz bikirim, lê min tenê 75 sent heye, li halekê ku nirxa destegula roz du dolaran e.

Mihemed girnijî û gotê: “Tevî min were, ezê ji te re destegulên roz ên sor bikirim.”

Dema Mihemed destegul jêre kirî û bihevre ji gulfiroşiyê derdiketin, Mihemed keçê re got: “Diya te li ku dibe, hez dikî te bigîjînim?” Keça biçûk destê Mihemed girt û got: “Li wir e,” û îşare bi goristana aliyê din ê şeqamê kir. Mihemed ew bire nava qebristanê û keçik li ser mezarek nû rûnişt û gul danî ser.

Dilê Mihemed pir hat girtin, nekarî xwe rabigire, vegeriya gulfiroşiyê, deste gul wergirt û 200 mayl ajotkarî kir da bi xwe deste gulê bide diya xwe.

www.charismaco.com

# Sergerdankirina 250 qutabiyan di sirr û seqema Zivistanê de



Dadgeha yek ji bajarên bakûrê welat, hukmê valakirina debistanekê ku 250 qutabî têde hene daye.

Li gor malperek hikûmetî bi navê “Atî”, debistana han a qonaxa navendî ye ku 250 qutabî li hene, sedema sergerdankirina qotabiyan di vê dema salê û seqema Zivistanê de divar nine.

Serbarê şopandina berpirsên debistanê û îdareya “Hînkirin û Perwerdê” , ne xwedî û ne jî parêzer amade nebûn ku daxwazên wan bipejirînin, û “îsrar” dikin ku di demekî nêz de debistan were valakirin.

Eva di halekê de ye ku pêwîst e dozgeriya wî bajarî pêtir bala xwe bide rewşa wan qutabiyên belengaz û malbatên wan di vê dema salê de di nav xof û rewşa xirab de nehêlin.

# Hezîneya miriyan jî zêde bû!

## qebr bi 20 Milyon Tûmen!

Li gor malpera "Dadna"ê amarên fermî nîşan didin ku nirxa qebran di Beheşta Zehrayê de girêdayî bi cura qebran heye û qatên erdê cudahî hene.

Bi awayekê ku di Beheşta zehrayê de jî her weke miheleyên Tehranê Bakûr û Başûra bajar heye.
Bi vê yekê jî, pêvajoya nirxa qebran bilez zêde dibe û niha nirxa her qebrek 2 metroyî, ji nirxa erd di bajarê tehranê de girantir e.

Birêveberê peywendiyên giştî yê Beheşta Zehrayê, zêdebûna nirxa qebran li Beheşta Zehrayê de bi tiştek siroştî da zanîn û got: 10 Milyon tûmen bo her qebrekê di Beheşta zehrayê de, pereyek zaf nine û mîna kirîna xaniyan li bajarê thranê, di her qonaxekê de bilindbûn û daketina nirxan heye ku nirxa qatên kevin ji yek heya 20 milyon tûmenan in.

Eva di halekê deye ku li her derek welat nirxa erd bo xaniyan daketiye, lê nirxa erd bo qebrên miriyan her ku diçe, zêde dibe.

# Ez, Tu, Ew

## HÎNEK CARAN NABE BÊ PERE TU TİŞTEK Lİ SER ZANİST BÊ NİVÎSANDİN

**W: Hemîd Moxtarî**

Ez diçûm dibistanê daku dersê bixwînim
Tu diçûyî dibistanê, jiber ku tere gotibûn, diviya bibî pijîşk
Ew jî diçû dibistanê, lê nediznî çima
Min perê berîka xwe, ya heftane ji bavê xwe werdigirt
Te pêwîstî bi vê perê nebû, ji ber ku pere herdem li mala ve de berdest bû
Ew jî hemû rojê piştî xwendinê li kileka şeqaman de binişt difrot
Mamosta gotibû înşayekê binivîsin
Mijar ev bû: zanist baştir e yan pere
Min nivîsamndibû zanist baştir e,
Diya min digot mirov ji rêya zanist ve dikare pare bidest bixwe
Te nivîsanidibû zanist baştir e
Rengê bavê te ji te re gotibû, tu ji warê pere ve bê niyazî
Lê wî inşa nenivîsandibû û lapera wî sipî bû
Xameya pênûsa wî rojek berê bidawî hatibû
Wê rojê mamosta gelek lêda
Zarokên din henekên xwe lê kirin û pê dikenîn
Wê rojê wî seba gişt tiştên xwe yên nebûyî girya
Tu kes nezanî wî çiqas hest bi sivikî û bêhurmetiyê kir
Diyar e mamosta jî nedizanî wî perê kirîna pênûsekl nebûye
Renge mamosta jî nedizanî ku pere û zanist hinek caran bihev re girêdayî ne
Hinek caran nabe bê pere tu tiştek li ser zanist bê nivîsandin
Ez li malekê de mezin bibûm ku li werza biharê
Bêhna gulan hewşa wê pir dikir
Yu li malekê de mezin bibûyî ku bi şewan
Bêhna wan gulan dihat ku bavê te bo diya te dikirî
Lê ew li malekl de mezin dibû ku der û dîwarên wê
Bêhna ew cixare û tiryakê lê dihat ku bavê wî dikişand
Salên dawiyê qonaxa piştî navndî bû
Divia me xwe bo çêkirina pêşerojê amade kiriba
Diba min zêdetir xwendiba, lewra ez ketim pey dewrên xwe
bihêzkirinê li warê waneyan
Xwendin li zanîngehên derveyî welat ji te re pêşerojek baştir hebû
Lê wî ne hez hebû û ne pere, dest ji xwendinê berda û li pey kar sergerdan bû
Rojanme çap bû
Her kesek li nav rojnaman de li pey tiştekê digeriya
Ez çûm rojnamê bikirim da navê xwe li nav laperên derçûyên zanîngehê peyda bikim
Tu çûyî rojnamê bikirî da li pey rîklamên şandina xwendekaran bo derveyî welat bigerî
Lê ew navê wî li nav rojnamê de bû. Rojek piştir di pevçûnekê de kesk kuştibû
Ew roj ez gelek ji vê hindê keyfxweştir bûm ku bixwazim bîr ji vê yekê bikim ku kesekî kesekî din kuştiye
Te jî wê rojê wek herdem piştî mêzekirina wêneyên rojnamê, rojname fire da
Lê ew li wir bû li nav laperên rojanê de
Bo yekemîn car bû ku di jiyan xwe de,
Ew qas biha pê hatibû dan!!!
Çend salek derbaz bû
Dema wergirtina encaman bû
Ez li benda wergirtina bawenameya xwe ya zanîngehê bûm
Te dixwazt bi bawernameya xwe ya doktorayê vegerî,
hemen hez û awat mêjdemiye bavê te
Lê ew hûmû rojê li benda bihîstina cîbicîkirina hikmê darvekirina xwe bû
Dema dadweriyê bû
Civaka me herdem dadweriyê dike
Ez keyfxweş bûm ku şanaziyê bi min dikin
Te hest bi serbilindiyê dikir ji ber ku civakê şanazî bi te dikir
Lê ew şermezar bû ku lome û nefrînan lê dikin
Jiyan didome...
Tu dem bi dawî nahê...
Ez serkevtî me, ez dibêjim encama hewla min bi xwe ye!!!
Tu pir serkevtiyê, tu dibêjî encama hewil p tekoşîna te ye!!!
Le ew li jêr mistek axê de ye, xelkê digot xetayê wî bi xwe ye!!!
Ez, Tu, Ew
Em qet bi hev re nebûn
Tu demê me hevdu nas nekir
Lê ger ez û tu li şûn wî bayîn
Çîrok dê çawa bidawî hatiba??!!!

www.charismaco.com

www.arsivakurd.org

# Çend Xalên Girîng Derbarê Pêkanîna Jiyana hevbeş

W: Elwac

Pêwîstî bi pêkanîna jiyan hevbeş di hundura her mirovek de ye. Me pêwîstî bi jiyan kirinê heye hember regeza berambera xwe. Me pêwîstî bi vê hindê heye heta dema ku zindî ne, ji tenêtiyê rizgar bin. Lê ger pêkanîna jiyanê di çarçoveyek drost û bi awayek lojîkane nebe, li cihê bidestxistina aramanî,berevajî bandor dibe û li cihê hebûna pêwendiyek kûr û dostane ligel ew kesê ku renge bo herdem bihevre bijîn, bi tewahî bi tenê dimînin. Lewra diviya em bi başî şarezayê mercên hilbijartina hevjîna/ê xwe ya pêşeroj bîn da bi hilbijartinek dirost bikarîn bersivek baş û dirsot bidin bo pêdivyên biyolojîkî û hundurî ên xwe.

**- Guncawabûn ji warê malbatî ve:**

Bi giştî, mirov di çarçoveyek malbatî de şikil digirin. Çarçoveya malbat û ew tişta ku wek dirostbûna kesayetî li nav malbatekê de heye, ji malbatekê bo malbatek din bi ferq e. Yanî j

Her malbatek li gor pêkhateya civakî û perwerdehiya taybetiya xwe, bandora cuda dixe ser wî/wê kesê. Jiber ku banora perwerdekirinê di çêkirina kesayetiyê de pir girîng e. Can watson bavê zanista derûnnasiyê dibêje: 50 zarokan bidin min û bibêjin çi kesayetiyekê dixwazin, profisor, polîs, dadwer, diz û... çê dixwazin?! Ezê pêka daxwaz we 20 salan piştre kesayetiyên ku we ji min xwestiye, di teslîmê we bikin. Li rastî de ew dixwaze bibêje ku perwedekirin, bi berhevdan ligel aliyên wek jinêtîkî û... xwedî badorek girîngtir e.

Malbat rolek girîn heye li çîkirina kesayetiya mirovan de, ku wusan e mirov li hilbijartina hevjîn, dema li kêleka bidestxistina pêdiviyên xwe yên hundurî (ku pir girîngti in ji pêdiviyên biyolojîkî) bersivek dirust werdigirin û ji dûdilê û cudabûn yan tirs ji tenêbûnê rizgar dibin, ku ew du kese ji warê malbatî ve bihevr re guncaw û nêzîk bin.

Bo mînak, diya xortekî, 30 sal e jiyana hevbeş pêk aniye, lê xwediyê tu tiştê nîne û erkê wê tenê şiştin, çêkirina xwarinê, zarokmezinkirin û... bûye. Zarokek ku nêrîn û dîtina wî derbarê jin bi vî awayî şikil giriye, ligel keçekê jiyana hevbeş pê tîne ku di nav malbata wê de, diya wê xwedî biryar bûye û rola wê li nav malabat de hebûye. Li encam de li jiyana wan du kesan de, nêrîna keç û kur derbarê hevjînê cuda dibe. Ku wusan e ew du kese ji warê malbatî ve bi hev re guncaw ninin û li dawiyê de dê tûşî pirsên mezin bin.

**- Jihev nêzîkbûna kultûrî:**

Tu tişk nîne ku pêwendî bi kuttûrê nebe, lewra pêwsît e keç û xort ji warê kultûrî ve bihev re nêzîk bin, hebûna cudahiyên kultûrî pir bador dixwe ser jiyan wan du kesan. Ger du kes ji hemû waran d bi hev re guncaw bin, lê ji warê kultûrî û civakî ve bihev re ne guncaw bin, çawa tevbigerin? Li wir e ku pêwîst dike derbarê kultûra hevdu hişyarî bidest bixin û bipejrînin, eva girîng e, nek eva ku bêhurmetiyê pê bikin û bibêjin çend nelojîkî û kirêt e! Ger ev





hişyarî û qebûlkirine hebe, bi curek bihev re hevkultûr dibin.

Xe nêzîkbûn ji warê kesayetî ve:

her miroek xwediyê kesayetiyek taybet bi xwe ye. Ger du kesên ku bihev re jiyana hevbeş pêk tînin, ji warê kesayetî ve ji hevdu dûr bin, bê şik tûşî aloziyan dibin. Bo mînak kesek ji warê kesayetî ve (dervexwaz) ya mirobek civakî ye û bi senahî hest û soza xwe eyan dike û zêdetir hez dike li nav civak û xelkê de be, ev kesayetiya tevî kesk din jiyana hevbeş pêk tîne û dirust berevajî ye û diyarkirina hest û sozan jêre pir zehmet e, li nav civakê de seh bi rehetiyê nake. ev du kesa bi hev re ne, lê seh bi tenêtiyê dikin û li pêşeroj de dê tûşî pirsan bin.

**- Nêzîkbûn ji warê baweriyan:**

Baweriyan, pêgehek gelek qahîm hene û kêmtir tên guhertin. Bo mînak keçek bawerî bi nixavtina olî nine, ciwanek ligel de jiyana hevbeş pêk tîne û daxwazê jê dike xwe binixêve. Renge keçik qebûl bike, lê tu baweriyek jêre nîne û ger hat û rojekê keçikê ji kurê bêzar bû û pirsek navbera wan pêk bê, ew dem dê fire bide.

- nêzîkbûn ji warê xwendewarî ve:

Vê xalê jî rolek pir girîng heye, pêwît e her du kesên ku bi hev re jiyan hevbeş pêk tînin, ji warê xwendewarî ve li astekê de bin. Hinek caran du kes li qonaxa lîsans de bi hev re nasiyar dibin, bihev re jiyan hevbeş pêk tînin, xory xwendina xwe didomîne û doktoraya xswe distîne û keç jî di hemen ast de domîne. Hêdî hêdî ev du kese ji hevdu dûr dikevin û çarçoveya nêrînên wan diguherin.

**- Nêzîkbûn ji warê aborî û civakî ve:**

Pirsa aborî û civakî curek nêrîn li jiyanê de pêk tîne, dema du kes ji warê aborî û civakî ve ji hevdu pir dûr bin, nêrîna wan derbarê jiyanê û riftarê wan bihev re pir cuda dibe. Pirsa aborî û civakî, şêwazên nêrîn, riftar û hizirkirinê li jiaynê de pêk tîne. Ku wusan e dema du kes ji du qatên cuda ji warê aborî û civakî ve bihev re jiyan hevbeş pêk tînin, nêrînên wan derbarê jiyanê bi hevre pir cuda ye, lewra hêdî hêdî tûşî pirsên mezin dibin.

**- Rezamenidiya dayk û bav:**

Nebûna rezamendiya malbatê, heta çendîn salan û heta heya dawiya jiyanê bandora xwe dibe. Baştir ev e ev du kese ku bi hev re jiyana hevbeş pêk tînin, rezamendiya dayk û bavên xwe bidest bixin û wan razî bikin. Diviya sedema dijberîkirina wan bizanin, ji ber ku pir caran dayk û bav bi sedema hebûna ezmûnên zêdetir, sedemên lojîkî derbarê dijberîkirina xwe bas dikin. Lewra baştir e dayk û bavê xwe razî bikin, û ger dîsan jî nerazîbûna xwe nîşan nedan, heta wergirtina rezamendiya wan bisekinin, yan jî li hizra kesek din bin bo jiyana hevbeş.

Ku wusan e diyarîkirina hevjînê girîngtirîn biryara jiyana mirovan e, normal e ku bihadan bi vê pirsê û hûrbûn li ser hemû warên wê, jiyanek serkevtî me re dabîn dike.

www.charismaco.com

# Hunermend nojdarên gelê xwe ne

**Daryûş**

Hunermend hertim cehd dikin ku bi harîkariya hunera xwe hin ji êş û keserên dilê xwe kêm bikin û ew êş û jana ku hîs dikin, li derûna xwe de derbixin û tev kul û janên heyî ji xwe dûr bixin. Jiyan, ezmûn û nemaze zanistê jî ew yeka daye xuya kirin ku hunera her hunermendekê eyankerê seh û jiyana wî hunermendî ye. Berhemên hunerî jî eyankerê hunera herî bilind û xwedî bandora hunermendan e. Samfoniyên Bîthovîn, ahengên Barbod, peykerên rodîn, kevalên Lîonardo Davînçî, nivîsokên Maksîm Gorgî û Çarliz Dîkênz, şanonameyên Oskar Wayld û fîlmên Çarî Çaplîn çîvanoka Mem û Zîn, serpêhatya kaveyê asinger û... hemî eyankerê wan rastiyan in.

Hunermend nojdarên derûnî yên gelê xwe û civaka xwe ne, ew êş û janên xelkê xwe destnîşan dikin û li hêla sînema, helbest, pexşan, muzîk, wênekêşan û... wan kul û êşan hêvir dike. Hunermend di xeylên xwe de, cîhanek ciwan û tejî ji hesretên evîngirtî ji paşerojek geş û rohn re diafrîne. Lewma civak hertim bi çavê rêz û pêzanînê ve mêzeyî berhemên wan yên hunerî dikin. Hunermend hertim di pêxema wan hez û hêviyên ku nekarîne di jiyana xwe de wan bidest bixin, di xeyalên xwe de hêlûnek taybet ji hez û hêviyên li dil de maye xwe re çêdikin û wan bidest dixin.



"Maksîm Gorgî" di mijara xwe a bi navê kesayetiyên mezin dema ku bi tenê dimînin çi dikin? Bas ji nimûneya şêwaza hin hunermendan dike ku rêyek pir başe bo nasîna pîskolojiya wan hunermendan, navbirî dinivîse ku, "Antuan Çîxof" rojekê di hewşa xwe de dirûnet û cehd dike ku kumê xwe ji rojê tejî bike û piştre li ser serê xwe bike. "Lêun Tolistoy" rojekê bi hêminî ji matmatokekê dipirse erê gelo rewşa te baş e. Herwisan "Dîl Karingî" pîskolojê bi nav û deng yê Amerîkayê di pirtûka xwe de bas ji hin şaşiyên hunermendan dike û derheq bi Niyoton dinivîsîne ku navbirî rojekê li cihê hêka mirîşkê demjimêra xwe di nava avê de dikelîn e.

Herdu Afrandinên hunerî û çêjwergirtin ji hunerê mirov ji nexoşiyên derûnî rizgar dike, lê cudahiyek ku di navbera wan duyan de tê xuya kirin ew e ku hunermend bi xwe ji rêya hunera xwe ve aram dibe, lê mirovê hunerhez qasek ji wê hunerê ku eyankerê serhat û jiyana wî ye weke alavek bo hêmin kirina derûna xwe mifahê jê werdigre. Mirovê hunerhez bi dîtina zehmet, îza û hez û newekheviyên jiyanê di hindurê wê hunerê de hez û meynetên derûna xwe li bîr dibe. Dema ku mirov berhemek hunerî dibîne û bi rih û derûna mirov re hev digre ew yek nîşana jiyana mirov e.

Lê gava di navbera hunermend û mirovê hunerhez de tu xalek hevpar tunebe, gorî hewce çêj ji wê hunerê nahê wergrtin. Hunermend û kesê hunerhez du dunyayên ji hev cuda hene ku ew du hin dijwarî û kêmasiyên taybet bi xwe hene ku ew kêmasiyane wedigerin ser herdu aliyan. lê ew du beşe di civakê de, di gelek waran de li hev nizîk in. Hunermend bi rêya hunera xwe ve êş û jana xelkê ku di dil û derûna wî de hatiye cihgîr kirin ji xwe dûr dixin û weke derûneke nesaxiyên civakê derdixe û mîna nojdarekê jî çareser dikin.

Lê ya ku ji tev aliyekê re xuya ye hunermendên Kurd jî bi salan e ku bi afrandina berhemên xwe yên hunerî, ew êş û kul û janên ku bi dirêjahiya dîrokê bi serê gelê me de hatiye, bi awayekî hunerî merhem kirine û herdem hêz û şiyanên xwe yên hunerî xistine xizmet çareser kirina hesret û hêviyên di dilmayî ên civaka Kurd û xeyalên xwe tevlî jiyana bi kul û keserên netewa xwe kirine. Gava mirov mêzeyî berhemên hunerî ên hunermendên Kurd dike, bi zelalî tê xuyakirin ku bingeha felsefeya wê hunerê çavkanîgirtî ji jiyan û serpêhatiyên civatgeha Kurdistanê ye ku hunermend xwastiye bi wê rêye hestên xwe bîne holê û moralek evîngirtî ji hêminî û tenahiyê bi gelê xwe re parve bike. Lewma hewce ye ku em berhemên hunermendn xwe bilind binirxînin û rêz ji xebat û tekoşîna wan ya hunerî bigrin.

**Çavkanî:**
**"Firoyd çi mîgoyed", nivîsîna Nesrollah Babulhewêcî**
**"Peydayişê dîn û huner" nivîsîna Can Dîmorgan**
**Govara Lawan**

## Muxtarnameya Îranê
### car din Sunî êşandin



Fîlma bi navê "Muxtarname" ku ji 45 beşan pêk hatiye, qederek e ku ji aliyê telefizyonên Îranê we tê belavkirin. Ew fîlm bas ji jiyan û serhildana Muxtar Eb Obîd Siqfî dike ku piştî bûyera Aşûrayê dest bi tolvekirina bikujên Îmam Husên, Îmamê sêyem yê Şîeyan dike.

Belavbûna wê fîlmê ji aliyê ragihandinên Îranê ve yê bûye cihê nerazîbûna parek berçav ji xelkê ola Sone û nemaze mamostayên Sunemeseb yên navenda olî ya "Ellzehra" li welatê Mîsrê. Ew li ser vê bawerêne ku di vê fîlmê de rayedarên Îranê bi awayekî eşkere êrîşê dikin ser Suneyan û bêhurmetiyê bi "Sehabeyên Pêxember" û nemaze "Ebdulahê kurê Zibîr" dikin.

Ew fîlma han bûye cihê dilgiraniya parek ji xelkê Îranê û bi taybetî gelê Kurd. Hacî Husên Emînî yek ji mamostayên ayînî yê Kurdistana Rojhelat, di gut û bêjek tevî Radyo Ferda ragihand ku: berpirsên welatê me bi weşandina van fîlman xelkek zaf ji xwe êşandine û ew dixwazin ku bi wan kiryarên xwe tovê netifaqiyê di nava ola Şîe û Suneyan de bireşînin û car din wan berdin canê hev. Navbirî kiryara han bi tundî şermezar kir û got ku ew yeka bi dijî wekhevî û biratiya navbera Şîe û Suneyan da zanîn.

Emînî di parek din a axaftina xwe de zêde kir ku dezgehên ragihandina Îranê çend carek din jî bi belavkirina fîlmên direwîn yên weke Îmam Elî û Yusif Pêxember, bêhurmetiyek zaf bi Sune û Mesîhiyan kirine. Ger ew rast dibêjin bila îzn û derfeta vê hindê bidin me jî daku em li radyo û telefizyonên Îranê de berevaniyê ji xwe bikin.

Hêjayî gotinê ye ku Komara Îslamî a Îranê heyamê çend salan e ku sermiyeyek berçav xistiye xizmet çêkirin û berhemanîna film û dekumentarên direwîn yên olî û dîrokî û bi wî awayî êrîşê dikin ser ol û dîroka neteweyên ne Şîe û bêhurmetiyê bi wan dikin. Ew kiryarên komara Îslamî bûye cihê xeyidîn û nerazîbûna zaf aliyên olî.

## Çîçekên Amerîkayê, weke pirtûka
### herî bi nirx hat firotin



Pirtûka "Çîçekên Amrîkayê" ji berhemên Can Cîmêz bi buhay 17 Milyon Dolaran weke binirxtirîn pirtûka cîhanê hat firotin. Pirtûka han ku xudiyê Lord Hazkêt yê xelkê Birîtaniya yê bû, di yek ji heracfiroşên bajarê "London"ê bi nirxek çavrênekirî û giran hat firotin.

Can Cîmêz Odoban yê nîgarkêş ev pirtûka han ku ji hizar wêne ji 500 çîçekên cur bi cur pêk hatiyê di heyamê 12 salan de berhem anî.

Modela nîgarên wê pirtûkê ji wan çîçekan pêkhatiye ku Can Cîmêz Odoban li heyamê wan 12 salan de li seranserê Amrîkayê ew nêçîr dikirin û piştre sernişîv li ban vedikirin û nîgarên wan dikşandin.

www.arsivakurd.org

# Hunera dawet û dîlanan li bakûrê Kurdistana Îranê

**Kewêzer**

Dema ku bas ji govend û dîlanê tê kirin, berî her tiştî hizra mirov bo xweşîderbirîn di rê û resmên şahiyê bi taybetî zewaca kur û keçan diçe. Lê felsefeya govend û dîlanan zaf li wê yekê kûrtir e.

Bi giştî dawetên Kurdî dewlemend in û hunerek zaf tê de dixuye. Lê di rastî de min zanyarî li ser tev govendên hemû deverên Kurdistanê nine, belkî ezê di vir de şîroveyek kurd liser dawet û dîlanên Kurdî li Bakûrê Kurdistana Îranê bikim.

Govendên fikulor ên wê deverê bi avayekî rêk û pêk hatine bingeh danîn ku her yek ji wan nav, aheng û sitrana taybet bi xwe hene. Ji aliyek din ve yasa û rêsayên taybet hene ku di dema birêveçûnê de gerek bihên berçavgirtin, ku ewa jî bi xwe nezmek taybet daye wan govendan.

Nezma wan şibê rêjeyên eskerî ne, li rêzbûn li gor bilindiya bejna dawetkeran û destgirtin bigre heya livên herî biçûk. Şîweya destgirtinê, milê aliyê serçûpiyê dikeve pişt milê dawetkerê pêş xwe ku ewa jî bo wê yekê tê berçavgirtin ku di govendên wê deverê de zivirîn bo aliyê çep, rast û vegeriyan bo piştve heye û ev cure destgirtine nahêle milên dawetkeran jihev bialin û pêşî ji livên wan bigrin, hereketa ser jî li gor ahengê dihê ragirtin û avirdan, herweha hereketên pê bihevre ne ku ger kesek pêyê xwe şaş bavêje di nav hemûyan de diyar e û kesê xetakar eşkere dibe.

Di wan govendan de herkes ji endamên girûpa dawetê bo serçûpî û binçûpiyê nabin, belkî dibe kesên jêhatî û zal biser hunera dawet û ahengan serçûpiyê bikişînin. Wan du kesên serçûpî û binçûpiyê rolê rêber hene, wêca di wir de ye derdikeve ku ger rêber bihêz û zal nebe, bêguman karê endamên girûpa wî serkevtî nabe. Weke her karek din şaşiya rêber eyan û berçav e, çimku ger rêber şaşiyekê bike bandorek nerênî li tev pêkhateya govendê dike.

Govendên devera han, pêk tên ji 3 komeleyan, "milanê, qêlîçê û şêxanî".

Govendên milanê sivik in û bi ahengên evîndarî û rîtmên sivik birêvediçin û pêtir hereketên leş rola sereke dilîze. Dawetên qilîçk ê, têliya qilîçê tê girtin û pirraniya hereketên wê dawetê bi dest û lewendiyan dimeşin. Herweha dawetên şêxanî, di hin ji wan de dest dihê girtin û di hinan de jî dawetker destên hev nagirin, girin, destên xwe yan liser kêlek yan jî li pişt xwe digrin. Ew komela dawetan, pirr zehmete û hereketên wê zaf û alozin, cureyên hereketên wê rezmî ne û şibê rêjeyek eskerî ne û pêtir hereketên pêyan rola sereke dilîzin. Gav vêtinên wê bi hejmar in jiber ku hereketên wê pirr zaf in ku dawetker gavên kim û zêde neavên yan jî di dema xwe de bizivirin.

Danîna wan govend, aheng û sitranan her yekê felsefeya xwe heye. Bo mînak emê felsefeya govendekê diher komeleyekê de şîrove bikin. Di govendênên milanê de, govendek heye bi navê hamdîl, ku sitrana wê viha destpêdike,"hamdîl hamdîl hamdîl bana" tê gotin ku xortek vîndar liser banê mala xwe libenda evîndara xwe dibe û dema keça evîndara wî derdikeve derê malê, xortê evîndar ji xweşiyan xwe hildavêje û dibêje hamdît hamdît liser banan, ku hereketên vê xwehilavêtinê û aheng û peyvên xwe liber kirine û ew govend firandine.

Di beşa qilîçê de, govendek heye bi navê ereban, ku ev dawet jî li gor çavkaniyên devkî di dema êrîşa sipaya ereban bo ser Kurdistanê bûye û Kurdan gotiye Ereban qirken qirken, xwîna neyaran firr ken. Di vê dawetê de jî dawetker bi serek bilin 5 gavan ber bi pêş davêjin û piştre bi serek nevî û xwar 3'ê gavan paşde tên. Felsefeya wê ev e ku dema Kurdan li hemberî Ereban berxwe dan bi serek bilind çên pêş û di encam de şikest xwarin û bi serek nevî paşde zivirîn û teslîmî sipaya Îslamê bûne.

Herweha di komeleya şêxaniyan de jî gişt wan dawetên şêxanî di meydanên şer de hatine çêkirin û hereketên wan bi rabûn rûniştin, xwe nevîkirin, çûne pêş û hatinr paş rezmî û eskerî ne û herweha aheng û sitranên wan govendan jî hemasî ne.



# Destbirakê rast

N: Reşîd Hemo
A: Cankurd

## Dibêjin (1)

**Destbirakê rast**

Kalemêrek hebû, kurekî wî hebû, ku gelek destbirak ji xwe re digirtin. Bavê wî jêre got: "Kurê min! Bila dostaniya te bi xelkê re hebe, lê destbiraka ji xwe re pir neke, bila yek be, bila bi te re rast be."

Kurê wî bi ya bavê xwe nedikir û gelek destbira ji xwe re çê dikirin.

Bavê got: "Kurê min! Ka îro em destbirakê te biceribînin, ka vî berxî serjêke, bixe vî çiwalî û deyne aliyê malê."got: "de biçe gazî filan destbirakê xwe ke, lê mesela berx jêre nebêje."

Kur çû gazî destbirakê xwe kir û hatin malê, got : "çî ye?"

Kalê got: "Bi Xudê îşev mirovek hate dor mala me, me jî ew kuşt û va ye me laşê wî xistîye çiwêl, divê îşev em wî ji hundir derxin û veşêrin, berî ku kes pê bihese."

Mêrik li çiwêl nihêrî, dît ku xwîn ji bin diherike, ew tirsiya û got:"Bi Xudê ez newêrim, hikûmet wê min jî bigire."

Bavê ji kur re got: "de biçe gazî destbirakê xwe yê din ke."

Kur çû gazî destbirakê xwe yê din kir, wî jî xwe neda ber.

Her çend destbirakên wî hebûn, gazî hemiyan kir, kesekî ji wan xwe neda ber.

Kalê got:"de biçe, gazî destbirakê min filan kesî ke, bila bê. Kur çû , gazî kirê, hat, ji piya sekinî, got: "Xudê xêra te bide, bira vê şevê çi qewimî ye?!."

Kalê got:"Bira! Hal hewal eve, ev mêrik hat bi ser me de mir, em dixwazin wî veşêrin, berî ku sibe li me rûn bibe."

Got:"Nexwe, ne wextaseknê ye, rabin çiwêl hildin pişta min, ezê bibim wî veşêrim.

Çûn çiwal anîn, derî vekirin, laşê berx derxistin û çîroka xwe û kurê xwe jêre got.

Bi kêf û henek goştê berx xwarin.

Hîngê, dîsa kalê ji kurê xwe re got: -"Destbirakê rast ewe, yê ku di tengiyê de li te bibe xwedî."

## Dibêjin (2)

Carekê Mûsa pêxember bi rê de diçû, rastî mêrûyekê hat, ku libek ax di devê wê de ye, bi rê de diçe. Jê pirsî, got: "Mêrû ya delal! Tu yê vê axê kude bibî?" Got: "Bi Xudê min dît ev girê han bi min ne xweşe, ezê ji wir rakim bibim alîyê han." Mûsa got:"Mêrû ya delal! Ma tu yê bi vî devê xwe yê jar karibî vî girê hanî mezin ji wir rakî?" Mêrûyê got: "Ez dibêjim, ezê karibim, lê min nikarîbû ezê di vê rê de nemirim jî?"

## Dibêjin (3)

Genim ji garis re got: "Ezê biçim hec, heya têm, tu yê li şûn min bibî nan, zarokan birçî nekî." Garis got:"Başe. Lê tuyê destûra min bidî, ku car-caran bibim bijêrek?"

Genim got:"-Hele tu çê-çê bibe nan, li ser sêlê neqete, bila bijêrek ji te re bin."

www.arsivakurdi.org

# Agirî

**Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye**
**Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne**

**www.kurdistanmedia.com/kurdi**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:**
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
**E - Mail: agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com**




## Turumbêla Ehmedînijad û pênûsa

### Malikî ketin bazara firotinê



Di çend rojên derbazbûyî de dezgehên çavdêrî ên Komara îslamî bi fermî firotina turumbêla Ehmedînijad ragihandin.
Di roja yekim a navnivîsînê de malperek taybet bi reklamkirin bo turumbêla Ehmedînijad hatiye vekirin û hin girêbest jî gihîştine wan, ku yek ji wan ji sermayedarek Ereb e ku 1 Milyon Dolar bo kirîna wê turumbêlê daniye.
Turumbêla wî cura "Pêjo 504"e û heya niha ragirtiye.
Biryar e ku di destpêka meha Şubatê de hevdem ligel yada şoreşa 1357' ê de li bajarê Abadanê turumbêla wî bikeve bazara firotinê.
Ji aliyek din ve jî bazirganek Kuwêt ragihandiye ku amade ye 7 Milyon Dolaran bide wê pênûsê ku Malikî, Serokwezîrê Îraqê hukmê lisêdaredana Seddam Husên pê wajo kiribû.
Hevdem gellek bazirganên din amadene wê pênûsê bikirin û bi pereyek zaf bidin mozexaneyên binav û deng.
Lê daxuyaniyek serokatiya Encumena Wezîrên Îraqê, rohn kirin ku bi tu awayekê ew pênûs li Îraqê naçe der û dê di mozexaneya Nîştimaniya Îraqê de bimîne.

## Ji esman çûkên mirî barîn



Li eyaleta Arkansan a welatê Amerîka ji esman çûkên mirî barîn. Li gora nûçeyan li Arkansas nêzikî nîvê şêve di demjimêr 23.30 de, ji nişka ve ji esmanan çûkên mirî hatin xwar. Li erdê nêzikî 2 kilometrên çarguşî hemû bû çûkin mirî. Çûkên ji ezmana mirî barîn ji cureyê çûkên reş in.
Berpirsên dewletê, lêkolînê li ser mirina çûkan li esmanan dikin. Lê tê gotin ku, sedema mirina wan dikare, ji barandina teyrokek bi hêz be, yan jî ihtimala ku brûskê li wan dabe heye. Herweha tê gotin ku, ji bo hinek sedeman refên çûkan rêya xwe guhertine û tuşî problema mirinê bûne. Encama lêkolînan dê sedema mirina çûkan li esman bide zanîn.
**Rojeva Kurd**

## "Avatar"ê rekurda kopîkirina neyasayî a

### înternetê di sala 2010'an de şikand




Fîlma "Avatar" ku ji aliyê derhêner Cîmêz Kamêron ve hatiye kişandin, bi yek ji fîlmên dîroka sînemaya cîhanê tê hesibandin ku bi awayekî berbiçav hatiye firotin. Herwisan di warê kopîkirina neyasayî a bi rêya înternetê ve li sala 2010'an jî pêş bû.

Li gor malpera "Turênt Firîk", fîlma Avatar di sala 2010'an de tenê ji aliyê yek ji malperên înternetî ên kopîkirina neyasayî ve, 2 Milyon û 600 Hizar caran hatiye kopîkirin. Fîlma Awartar ku di sala 2010'an de 3'ê xelatên Oskar û 2 xelatên Guldin Golb wergirtine, kariye serhildanek mezin di berhemanîna sînemaya cîhanê de biafirîne û bi firotina qasî 2 Milyard û 800 Milyon Dolaran bibe yek ji pirrfiroştirîn fîlmên dîroka sînemaya cîhanê.

Derhênerê 56 salî Cîmêz Kamêron ragihand ku beşa duyem a fîlma Awatar yê li sala 2014'an û pişka sêyem jî di sala 2015'an de yê bihê belavkirin.

## Temenê vê jinê 123 sal e û

### hêj pizîşk nedîtine.



Selma di konekê de di himêza çiyayê Almaxara de li herêma Aisîna bi tenê dijî.
Bi tena xwe ji bilî bîranînên temenê dirêj (123 sal) 12 law û keç û 100 neviyên wê hene.
Ligel wê yekê jî di konê xwe de bi tenê jiyan dike.
Hemû zarokên wê zewicîne, temenê yê mezin 90 sal e.
Neviyekî wê got: Pîrika min hîç bijîşk (nojdar) nedîtine, tenê carekê ji bo çavên wê, bi dijwarî û bi zorî ew bir bal pizîşk, ji bo dîtina wê berçavkek jê re çêkir.

## Valintayn, cejna eşq û evînê di Îranê de

### hat qedexekirin



Malpera "Nedayê Sebzi Azadî" wiha weşand: di nêzîkbûna roja valintaynê, Yekêtiya çapxaneyan, di daxuyaniyekê de belav kirin ku, çap û berhevkirina her cure alavên rêklam bo wê rojê ên weke gulên roz, wêne û şeklên dil û nîvdil, kartên teblîxî qedexe ne û her cure çalakî di wî warî de bihê dîtin, dê ji aliyê organên pêwendîdar ve bihên cezadan. Vê nûçeyê herweha dengvedanek navnetewî jî peyda kir.

Rojnameya "Lîberasiyon" ê ya çapa Parîsê wiha nivîsand: Hezkirina 14'ê Febroariyê, anko roja valintaynê di nav ciwanên Îranî de roj bi roj zêdetir dibe, eve li halekê deye ku rejîma Komara Îslamî a Îranê li destpêka heştêyan de mejûlî xebat dijî tiştekê ye ku rejîm bi nîşaneyên nifûza kultora rojavayî nav dibe.